# Rola jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê di dosya kesên wendayî de



GAV FOR RELIEF & DEVELOPMENT

Mari Research And Development

Lasting Peace

# Naverok


4-3 Puxteya cîbicîker
6-5 Pêşgotin
7 Rêbaz

Yekem: çarçovya yasayî- kesê wendayî li gorî zagonên niştîmanî û navdewletî de

8 Kesê wenda li gorî yasaya navdewletî
9 Kesê wenda li gorî yasaya Sûrîya
10 Leşkerên wendayî di yasaya leşkerî ya Sûrî de
10 Kesên wendayî di yasayên rêveberiya xweser de
11 Pirsgirêkên di çarçoveya yasayên sûrî de

Dûyem: Rola jinan di rêxistinên ku di piroseyên belgekirinê de kar dikin.

13-12 Giringîya dosya kesên wenda
14 Rola jinan di dosya kesên wendayî û girîngîya wê ji bo wan
15 Şêwe û awayên alîkariyê
16-15 şêwe û awayên alîkariya zindî
17 şêwe û awayên alîkariya ne zindî

Sêyem: Belgekirina zanyarîyan

19-18 parvekirina di karên belgekirin û komkirina zanyarîyan de
20-19 Pirsgirêkên belgekirin û komkirina zanyarîyan
22-21 Rênimayên giştî

# Puxte:

Ji destpêka xwepêşandanan ve li bakurê Sûrîyeyê sala 2011an û heta vekişîna hêzên hikûmetê di 2013an de, hejmara windayîyan li wan deveran zêde bû. Hêja ye gotinê ku destê hêzên hikûmetê di vê meseleyê de heye, çimkî bi dehan kes li navendên sekinandinê û zindanan hatin windakirin; kesên windayî jî ev bûn: Karmendên biwara mirovî, çalakvan û leşkerên ji artêşê veqetiyayî. Di qonaxa Daişê de jî qonaxa ku Daişê rûbereke berfireh ji parêzgeha Dêrezorê û parêzgeha Reqayê bi timamî û hin beşên parêzgeha Hesekê kontorl kirin û heta ku di adara 2019an de dawî lê hat, di vê qonaxê de rêjeya windabûn, kuştin û veşartina terman pir zêde bû. Prosesa windakirinê ev kes tev girtin: Rojnameger û çalakvanên biyanî û jin û zarokên êzdî yên Şingalê ku Daişê ew bi xwe re anîne Sûrêyeyê. Hemû pêkhete û niştecihên deverê ji windabûnê nesilmîn di nav de ereb, kurd, aşûr, êzdî û biyanî, her wiha ev kes ji komên siyasî û leşkerî yên cuda cuda bûn.


Nirxandinên Neteweyên Yekbûyî di sala 2021ê de amajeyê bi wê yekê dikin ku zêdeyî 100 000 kesî ji encama şer û pevçûna li Sûriyeyê windayî ne. Ji ber ku destê hikûmeta Sûrîyeyê û alîyên şer di sûcê windakirin û binçavkirinê de heye û ji ber ku zehmet e mirov xwe bispêre alîyên şer da ku çarenûsa windayîyan bê dîyarkirin, barê herî giran ketiye li ser milên malbatên windayîyan, rêxistinên civaka sivîl û rêxistinên navneteweyî. Di vê navê re, navendeke zanyarîyan jî nîne ku hejmara windayîyan destnîşan bike ku destnîşankirina hejmarê bi prosesa lêgerînê re lêgerîna termên kesên ku laşê wan nehatiye dîtin û bi prosesê taqîkirin û dîyarkirina çarenûsa wan re dibe alîkar.

**Ji ber ku jin bi rengekî berfireh tev li jiyana giştî li deverên bakurê rojhilatê Sûrîyeyê bûne, têkildarî gelek meseleyên ji bo nişticihan girîng bûne, di nav de meseleya windayiyan û rîakisyona bi malbatên wan re.**

Ev lêkolîn rola jinên ku di rêxisatinên civaka sivîl de dixebitin, li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê, gengeşe dike; bi taybet çalakvanên jin yên di warê mafên jinan û mafên mirovan de. Her wiha ev lêkolîn behsa van mijaran jî dike: Rola jinê di şopandina pirsa windayîyan de û tevrakirina li nik alîyên pêwendîdar yên nevdewletî û xwemalî, karê ku çalakvanên jin dikin da ku çarenûsa van kesên windayî û binçavkirî binasin, arîşeyên ku li pêş beşdarîya jinan dibin asteng û prsgirêkên ku li pêş alîkarîya bi malbatên windayîyan re dibin kelem, ev alîkarî jî bi sponseriya Komîteya Navdewletî ya Karûbarên Windayîyan ICMP û hevkarîya Ofîsa Demokratiyê û Mafên Mirovan û Kar ya Wezareta Derve ya Amerîkayê “DRL” pêk tê.

Evê lêkolîn xwe spartiye rêbaza cureyî, bi rêya pêkanîna hevdîtinan bi jinên serkêş re ku di warê mafên jinan û mafên mirovan de dixebitin, her wiha hevdîtina bi çalakvanên jin re yên di warê civaka sivîl de. Beşdarên lêkolînê ji her sê parêzgehên bakurê rojhilatê Sûrîyeyê ne, Hesekê, Reqa û Dêrezor û ji cureyên cuda cuda ne.

Her wiha lêkolînê xwe spartiye heyberên heyî yên her kes dikare bigihe wan û ev heyber ji jêderên vekirî hatine wergirtin di nav de nivîsar û raporên nûçeyî. Deme ku cudahî di navbera agahî û hejmaran de çêdibû, lêkoleran hemû zanyarî ji çavkaniyên yekser taqî dikirin.



# Pêşgotin:

Pirsa windayîyan û zêdebûna hejmaran ji adara 2011an ve û heta weke niha, ji encamên herî kambax yên şerê çekdar yê li Sûrîyeyê ye.[1] Nirxandinên Neteweyên Yekbûyî di sala 2021ê de amajeyê bi wê yekê dikin ku zêdeyî 100 000 kesî ji encama şer û pevçûna li Sûriyeyê windayî ne . Weke beşekê ji piştgiriya wê ji bo karê lêgerîna windayîyan, girtî jî di nav de, Komîteya Navdewletî ya Karûnarên Windayîyan embareke navendî ya zanîyarîan saz kir. Heta niha zanyarî li ser nêzî 50 000 malbatên windayîyan tê de hene ku van malbatan navên 20 000 kesên windayî dane. Ev embar bi zanyarîyên van malbatan mezin dibe .[2]

Ji ber ku destê hikûmeta Sûrîyeyê û alîyên şer di sûcê windakirin û binçavkirinê de heye û ji ber ku zehmet mirov xwe bispêre alîyên şer da ku çarenûsa windayîyan bê dîyarkirin, barê herî giran ketiye li ser milên malbatên windayîyan, rêxistinên civaka sivîl û rêxistinên navneteweyî. Di vê navê re, navendeke zanyarîyan jî nîne ku hejmara windayîyan destnîşan bike ku destnîşankirina hejmarê bi prosesa lêgerînê re lêgerîna termên kesên ku laşê wan nehatiye dîtin û bi prosesê taqîkirin û dîyarkirina çarenûsa wan re dibe alîkar.

Pêkanîna prosesên lêgerîn, şopandin û dîyarkirina çarenûsa windayîyan li ser peydabûna zanyarîyan dimîne, her wekî zanyariyên kesayetî û zanyarîyên girêdayî dîdaveniyên li ser cihê dawîn yê ku kesê windayî lê hat dîtin yan cihê veşartî yê laş û terman her wekî çawa li Reqa û Dêrezorê gorên komî hatin dîtin. Ku lêgerîna gorên veşartî hîn jî berdewam e.



1 Nûnerên civaka sivîl ya sûrî û malbatên windayîyan di nîqaşekê de ku Komîteya Navdewletî ya Windayîyan li dar xist, karên pêkan ji bo pirsa girtîyan nîqaş dikin, danezana Komîteya Navdewletî ya Windayîyan, 12 nîsana 2021ê: https://bit.ly/3oJBhmj

2 Heman jêder

Wekî rola rêxistinên civaka sivîl li Îraq, Libnan û Belqanê û deverên din yên ku şer li wan çêbûye, roleke mîna wê ya civaka sivîl jî li bakur û rojhilatê Sûrîyeyê di vê pirsê de heye. Di vê çarçoveyê de çalakvanên jin yên di rêxistinên pêwendîdar de karekî girîng ji bo vê pirsê kir.

Ev lêkolîn rola jinên ku di rêxisatinên civaka sivîl de dixebitin, li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê, gengeşe dike; bi taybet çalakvanên jin yên di warê mafên jinan û mafên mirovan de. Her wiha ev lêkolîn behsa van mijaran jî dike: Rola jinê di şopandina pirsa windayîyan de û tevrakirina li nik alîyên pêwendîdar yên nevdewletî û xwemalî, karê ku çalakvanên jin dikin da ku çarenûsa van kesên windayî û binçavkirî binasin, arîşeyên ku li pêş beşdarîya jinan dibin asteng û pirsgirêkên ku li pêş alîkarîya bi malbatên windayîyan re dibin kelem, ev alîkarî jî bi sponseriya Komîteya Navdewletî ya Karûbarên Windayîyan ICMP û hevkarîya Ofîsa Demokratiyê û Mafên Mirovan û Kar ya Wezareta Derve ya Amerîkayê “DRL” pêk tê.

Ev pirs bi teybetî ji bo jinan girîng e; ji ber ku kesê herî zêde zîyanê ji meseleya windabûn û binçavkirina hevjîn û birayan dibîne, jin bixwe ye. Xaleke din jî heye ku bi rêya wê re girîngiya vê lêkolînê li ber çavan tê raxistin, ew jî mijara bihêzkirin û xurtkirina jinê ye da ku bikare serderyî bi vê pirsê re bike.

# Rêbaz:

Evê lêkolîn xwe spartiye rêbaza cureyî, bi rêya pêkanîna hevdîtinan bi jinên serkêş re ku di warê mafên jinan û mafên mirovan de dixebitin, her wiha bi çalakvanên jin re yên di warê civaka sivîl de. Beşdarên lêkolînê ji her sê parêzgehên bakurê rojhilatê Sûrîyeyê ne, Hesekê, Reqa û Dêrezor û ji cureyên cuda cuda ne.

Her wiha lêkolîne xwespartiye heyberên heyî yên her kes dikare bigihe wan û ji jêderên vekirî hatine wergirtin di nav de nivîsar û raporên nûçeyî. Deme ku cudahî di navbera agahî û hejmaran de çêbû, lêkoleran hemû zanyerî ji çavkaniyên yekser taqî kirin.



# Yekem: Çarçoveya zagonî kesê windayî di zagonên niştimanî û navdewletî de

## Kesên windayî di zagona navdewletî de

Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor, kesên windayî wiha pênase dike: "Kesên ku malbtên wan cihê wan nas nakin û/yan, li ser esasê hin agahîyan ku dibe rast bin ya şaş bin, windabûna wan hatiye ragihandin ku ev windabûn girêdayî şerekî çekdar yê navdewletî yan nenavdewletî ye, yan jî girêdayî rewşeke tundiyê yan nakokiyên hundirîn e. Yan dibe ku ev windabûn girêdayî rewşeke din be ku pêdiviya wê bi desttêwerdana navbeynkarekî bêlayan û serbixwe heye." [3]

Rêzika 98an ji lêkolîna zagona navdewletî ya mirovî ya ku Komîteya Navdewletî ya Xaç Sor di sala 2005an de weşand, piştrast dike ku "Windakirina kesekî di şerên çekdar yên navdewletî û nenavdewletî de qedexe ye."[4]




Pabendiyên zagona navdewletî di mijara rewşên windayîyan de xwe dispêrin zagona mirovî ya navdewletî û zagona navdewletî ya mafên mirovan û "heke zagona mirovî ya navdewletî, bi taybet ji bo serderiya bi şerên çekdar re hatibe danîn, li gor wê peymanên mafên mirovan di hemû dem û mercan de li ser hemû kesên ku di çarçoveya desthilata dadgerî ya dewletê de ne, bi cih dibin"[5]. Ev pabendî di Rêkeftina Cinêvê de hatine ya ku di tebaxa 1949an de hate girêdan. Di vê rêkeftinê de ew pabendî hatine rêzkirin ku divê aliyên şerê çekdar yê navdewletî wan bi cih bînin, ew jî ku divê hemû bergiryên pêkan ji bo dîyarkirina çarenûsa windayîyan û lêgerîna kesên ku alîyê hevrik windabûna wan ragihand û tomarkirina zanyarîyên taybet bi van kesan, pêk bînin.

3 Kesên windayî û mirê, Ferhenga Parktîkî ya Zagona Mirovan: /https://ar.guide-humanitarian-law.org/content/article/5/lmfqwdwn-wlmwt

4 Heman jêder

5 (A/HRC/16/70) Rapora Komîteya Şêwerdariyê ya girêdayî Mecilsa Mafên Mirovan li ser kiryarên herî baş der barê pirsa kesan de, 21 sibata 2011an https://undocs.org/pdf?symbol=ar/A/HRC/16/70

# Kesên windayî di zagona sûrî de (rewşên kesayetî)

Zagona rewşên kesayetî ya sûrî di madeya 202yan[6] de kesê windayî wiha pênase dike: “Ew kes e ku mirov nizane ka sax e yan mirî ye. Yan jî mirov dizane bê ku sax e, lê cihê wî nayê naskirin”. Madeya 203yan ji heman zagonê, kesê ku neamade tê hesbandin, wiha destnîşan dike: “Her kesê ku zêdeyî salekê û ji ber rewşên zorbir nekariya vegere warê xwe yan nekariye karûbarên xwe bi xwe yan bi rêya nemînendeyekî bi rê ve bibe ku bi vî rengî karê wî û karên kesên din jî sekinîne, weke kesekî windayî û neamade tê dîtin”



Yê neamade; ew e wekî kesê wendayî ye ku rewşine awarte rê li ber vegera wî bo cîûwarê wî girt ku nema dikarî karûbarê xwe bi xwe bi rêve bibe yan jî kesên berdêl li şûn xwe deyne ku heman karî bi rêve bibe, di encamê de her tiştên wî hatin rawestandin.[7]

Ji ber wê û bi sedema pirsgirêkên ku di encama van rewşên wendayê de, hat xwestin ku yasaya Sûryê qada dozên derbarê sûcdariyên zagonî berfireh bike, taybet yê girêdayî rewşên wendayîyan. Di vê derbarê de di madeya 204an de, zagona rêvebirina karûbarê kesên wendayî, yê neamade û kesên ku karê wan bi rêve dibe çi yê dayîm be, berdêl be yan jî yê mîratgirtê wî be, hat xwestin ku berdêlek ji kesê wendayî re were danîn, ango cîgirekî zagonsaz be.

Cîgirê zagonsaz;[8] ew kesê ku ji hêla dadger ve tê cîbicîkirin da ku karûbarê wendayî bi awayekî zagonî bi cih bike.

Zagona rewşên taybet li gorî madeya 204an tê gotin; piştî wendabûna çar salên peyhatî yên bi sedema rewşên şer û yên cuda ve, ew kes mirî tê diyarkirin.[9] Wê demê ji dê yan jî hevsera kesê wendayî tê xwestin ku dest bi çêkirina belgeyên tekûzkirina wendabûna wî bike ku dozeke zagonî ji aliyên sûcdar bi amadebûna du çavbînan re radike.

Her wiha dewleta Sûryê bi sazîyên xwe yên têkildar ve tu barê lêgerîna li yê wendayî ranake ser milê xwe, ango wendabûna 100hezar kesî di van salên dawîn de li ser milê malbatên wan hiştiye.

6 Zagona rewşên kesayetî, hejmara 59an ya sala 1953yan: http://parliament.gov.sy/arabic/index.php?node=201&nid=1v1333&ref=tree&

7/8/9 Heman jêder

## Li gorî zagona leşkerî ya Sûryê wendayîyên leşkerî

Tevî bendên ku li ser ê leşker tên pesendkirin jî, lê fermana cîbicîkar ya bi numareya 15 ji sala 2019an di benda xwe A ji madeya yekemîn diyar dike ku; leşker ew kesê ku nediyar e ku sax an jî mirî ye yan jî sax e lê cihê wî bi sedema rewşên şer yan li ser destên girûpên çekdar an dijber yan jî rewşa erka xweparastinê nediyar e. Li vir yê wendayî heman derfetên sûdmendiyê yên pakrewanan bi dest dixe, ango benda H ya ji zagonên miryetdar ve wekheviya nirxdayînê di navbera pakrewan û wendayî de pêk anî .[10]



## Li gorî zagonên rêveberiya xweser, kesên wendayî

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûryayê ku di sala 2019an de biryara erka xweparastinê xiste miriyetê, di madeya yekemîn di benda T de pênaseya wendayî diyar kir.

Wendayî: Ew kesê ku agahîyên wî hatin biranidin, ku nediyar e ger sax an jî mirî ye, li vir sûc û rewşên kesê wendayî li gorî zagona Sûryê li ser pêk tê, ew kes çi leşker be yan jî sivîl be.[11]

10 fermana cîbicîker numareya 15 ji sala 2019 ku du made li zagonên erka xweparastinê û ya ewlehiya hundirîn bar dibe, li rex zêdekirina du madeyên zagornên maçên leşkeriyê û maşeyên ewlehiya hundirîn, 31 tîrmeha 2019an. https://bit.ly/3EKTjKt


11 bihûrbînî....zagona erka xweparastinê li rêveberiya xweser a bakur û rojhilatê Sûryayê:acansa Hewarê, 22hezîrana 2019 https://bit.ly/3yexsZt

# Kêşe û kelemên di çarçoveya zagonî ya sûrî de

Di 16ê îlona 2021ê de, wezîrê dadê yê hikûmeta sûrî giştînameyeke bi hejmara 30 derxist. Gerek di rewşên çêkirina karspêrnameyên wendabûn an dûrketinê de, bi rêya wê erêkirina ewlekarî ya pêşinde were bidestxistin. Lê belê ev merc li dij hukmên zagona rewşên kesane ya sûrî bixwe ye. Ango ne merc e ku ti cureyên erekirina ewlekarî were bidestxistin (Madeya 202 heya madeya 206an).

Rêxistinên sûrî dît giştîname “Mafên xizmên kesên wendayî û kesên dûrketî binpê dike û li dij zagona sûrî û destûra sala 2012an e“. Lê belê rêxistineke mafnasî ya sûrî dît ku madeya 205an ya ku li jor amaje pê bûye, ziyanê di asta yekemîn de digihîne mafên jinan. Sedem ew e ku erêkirina ewlekarî ya li gor giştînameya (H30) weke mercê ji bo jin û dayîkan “ Metirsiya tundiya axaftinê û kêmxistina heyberî ya li dij jinê/dayîkê zêde dike û digihêje asta binpêkirinên din jî“. Her wiha teqez giştîname dê keleman li hember rêkarên zagonî yên bê (Mîras, derxistina pelikên çespandinê, livandina hesabên bankê, derxistina kerta bankî, wergirtina mûçeyan ji devla kesên wendayî û yên dûrketî) de jî çêke.[12]

Di çarçoveya zagonî ya sûrî de, tenê piçek parastin ji bo kesên wendayî û malbatên wan heye. Li gor nirxandineke komîteya navdewletî ya karûbarên kesên wendayî, ji sala 2011an ve, ji bo ku malbat bidin diyarkirin ku kesên wendayî hene, ji bo rewşa wan agahiyan bi dest bixin û hukmên dozgerî werin bidestxistin da ku ew weke nûnerên zagonî yên karûbarên darayî, xwedîtî û mîrasê kar bikin, van malbatan her û her kelem didîtin. [13]



12 12Sûriye: Giştînameyeke wezareta dadê ku “Erêkirinên ewlekarî“ karspêrnameyên kesên dûrketî û yên wendayî disepîne, 22 ,سوريون من أجل الحقيقة والعدالة cotmeha 2021ê https://bit.ly/3DLAs0z

13 Kesên wendayî yên bakurrojhilatê Sûriyeyê: kirariya nirxandinê, derxisteya Komîteya navdewletî ya Karûbarên Kesên Wendayî icmp ya di 25ê adara 2020î de. https://bit.ly/3EN4pOT

## Duyem- Rola jinan di rêxistinên ku di warê pêngavên belgekirinê de dixebitin

### Girîngiya dosyeya kesên windayî

Di navbera destpêkirina şoreşê li bakurê Sûriyeyê di sala 2011an de û heya ku hêzên hikpmetê di sala 2013an de xwe ji herêmê vekişand, hejmara kesên windayî li herêmên bakurê Sûriyeyê zêde bû. Ji xwe destê aliyên nakokiyê di vê bebetê de heye. bi dehan kes di navendên girtinê û girtîgehan de hatin windakirin. Ev kesên windayî di biwarê karên mirovahî de dixebitîn an jî çalakvan û leşkerên ku ji rêjîmê cihê bûbin.[14]Di qonaxa ku Daiî herêmine berfereh ji parêzgeha Dêra Zorê û tevahî parêzgeha Reqayê û hin beşên parêzgeha Hesekê desteser kiribûn û heya dawiya desteseriya wî di avdara 2019an de, hejmara kesên windayî, kuştin û veşartina terman, gelekî zêde bû. Van prosesên windakirinê, rojnameger û çalakvanên biyanî, zarok û jinên êzîdiyên Şingalê jî hewandin. Ev êzîdî ji hêla Daişê ve bo Sûriyeyê hatibûn anîn û ji aliyê zayendî ve hatibûn kolekirin. Lîseya kesên windayî, gelek çînên niştecihî yên ji nijadên cihêreng hewandin (ereb, kurd, asûrî, êzîdî û biyanî û komên siyasî û leşkerî yên cihêreng)

Bi dawîbûna desteseriya Daişê û piştî ku HSDê bi hevkariya Hevpeymana Navneteweyî herêm desteser kir, daxwaz û prosesên ku doza eşkerekirina çarenûsa kesên windayî zêde bûn. di encamê de pêvajoya bi navê "Ka kesên ku Daişê ew revandibûn?" Ev pêvajo di encama kombûna malbatên kesên windayî û revandî de pêk hat. Van pêvajoyan berê xwe da "Komîteya Navneteweyî ya Karûbarên Kesên Windayî li Sûriyeyê" ku bi piştgiriya Yekîtiya Ewropayê ji sala 2016an de dest bi karê xwe kiriye.[15]

14 Kesên windayî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê: pêvajoyeke nirxandinê, Komîteya Navneteweyî ya Kar û Barên Kesên Windayî derxistiye / icmp/ 25 avdar 2020. https://bit.ly/3EN4pOT

15 Gerîna li rastiyê piştî rêxistina Daişê. /https://truthafterisis.org/ar/the-search-for-truth-arabic

Di encama zêdebûna daxwazên malbatan da ku çarenûsa xizmên wan ên windayî were nasîn, hejmarek tîmên bersivdayîna seretayî bi piştgiriya meclisên xwecihî yên Dêra Zorê û Reqayê hain damezirandin. Her wiha MSDê di nîsana 2020an de ragihand ku wê tîmeke karê sivîl bi navê "Sûrî ne ji bo kesên girtî û revandî" ava kiriye. Her wiha bernameya perwerdeya xwecihî bi hevkariya rêxistinên navneteweyî saz kir. Di payîza 2019an de, Navneda Sûrî ya Dadmendî û Lêpirsînê, bexşek ji projeya "Kirêtîv Esoşîst" wergirt da ku bernameya pererde û nirxandina bernameya bersivdayîna seretayî bi cih biîne.[16]

Li gorî ku Komîteya Navneteweyî ya Karûbarên Kesên Windayî (ICMP) di rapora xwew ya ku di 21ê tîrmiha 2020an de weşandiye, amaje pê kiriye, girîngiya dosyeya kesên windayî li Sûriyeyê ji wê yekê tê ku ew "veberhênaneke di Aştiyê de"
Hin aliyên jinan li bakur û rojhilatê Sûriyeyê, girêdanekê di navbera berdana girtiyên nerîn, wijdan û kesên revandî û eşkerekirina çarenûsa kesên ku bi zorê hatine windakirin de dibînin, çimkî ew bingeha sereke ye ji bo pêkanîn û bipêşxistina prosesên avakirina baweriyê di navbera aliyan de.[17]

16 Gerîna li Kesên windayî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê, nirxandin û qewîtiyên tîma bersivdayîna lezgîn, Navenda Sûrî ya Dadmendî û Lêpirsînê, reşemiya 2022 https://bit.ly/33ejWtf

17 Hevdîtinek bi hevseroka komîteya "Sûrî ne ji bo kesên revanfî û girtî" Cîhan Mihemed re.

## Rola jinan di dosyeya kesên windayî de û girîngiya vê babetê ji bo wan:

Ji ber ku jin bi awayekî berferh beşdarî jiyana giştî ya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê dibin, bêtir nêzî mijarên girêdayî jiyana mirovan in , bûne. Yek ji wan mijaran jî, mijara kesên windayî û kartêkirina wan bi malbatên wan windayan re. Bi taybet ji ber ku malbatên kesên windayî -li gorî rêvebera giştî ya Komîteya Navneteweyî ya Karûbarên Kesên windayî "Katrîn Bombirgir"- gihaştine rewşeke pir xerab.[18]

Bi rêya hevdîtinên ku bi çalakvanên jin re li herê parêzgehên bakur û rojhilatê Sûriyeyê hatin çêkirin ku armanc ji wan hevdîtinan diyarkirina rola jinê di doza kesên windayî de, kesên beşdar li ser girîngiya dosyeya kesên windayî tekez kir. Çimkî çareserkirina dosyeyan bi awayekî lezgîn, rê li ber wê yekê digire ku ev dosye ji dosyeke mirovî ber bi dosyeke veberhênan û bikaranîna siyasî ve biçe.[19] her wiha dosyeya kesên windayî li Sûriye, yek ji dosyeyên herî girîng e, bi taybet piştî ku bi hezaran kesên sûrî jiyana xwe ji ber operasyonên leşkerî ji dest da yan jî hatin girtin û koçberkirin. Ji aliyekî din ve, aliyê herî zêde di babeta kesên windayî de bandor lê tê û ziyan digihêjiyê, jin e. Çimkî ew yan hevjîn, yan dê yan jî xwişka kesê windayî ye. piraniya giliyên ku ji me re tên ji hêla jinan ve tên. Van jinan hevjîn an bira an jî bavê xwe winda kirine.[20] Ev yek jî dihêle dosyeya kesên windayî girîng be ji bo me. Çimkî aliyê ku girîngiyê dide vê dosyeyê, jin û çalakvanên jin ên ku di biwarê mafê mirovan an jî di biwarê karên siyasî de dixebitin.[21]

Faktoreke din heye ku dihêle jin alîkariyê di babeta kesên windayî de bikin. Li gorî ku Zozan Elûş dibêje, ya ku hişt ez bi vê dosyeyê ve werim girêdan, destpêkê, ew e ku ez jin im ya din jî ew e ku hejmarek jinên girtî di yekê ji girtîgehan de hebûn. Ev jin di şerê hundirîn ê di navbera opozsyona Sûriyeyê de çêbû, hatin girtin. [22]



18 Nûnerên civaka sivîl ên sûrî û malbatên kesên windayî, rêbazên bipêşxistina karûbarê kesên windayî de nîqaş dikin, daxuyaniya Komîteya Navneteweyî ya Kesên Windayî 12 nîsan 2021. https://bit.ly/3oJBhmj

19 Nûnerên civaka sivîl ên sûrî û malbatên kesên windayî, rêbazên bipêşxistina karûbarê kesên windayî de nîqaş dikin,
20 Hevdîtinek bi Zozan Elûş re (endama Meclisa Şêwirmendiyê ya şandeyê taybet bi Sûriyeyê.
21 Hevdîtinek bi Evîn Cuma re (birêvebera Rêxistina Mafê Mirovan li Herêma Cizîrê)
22 Hevdîtinek bi Zozan Elûş re (endama Meclisa Şêwirmendiyê ya şandeyê taybet bi Sûriyeyê.

## Şêwe û mekanîzmeyên alîkariyê:

Hewildanên ku dixwazin alîkariyê di diyarkirina çarenûsa kesên windayî de li bakur û rojhilatê Sûriyeyê de bikin, kêm û ne birêxistinkirî xuya dikin. Her wiha rûbirûyên ku rêxistin û kesên girêdayî dosyeya lêgerîna li kesên windayî rastî tên, li gorî qebareya dosyeyê û pileya daxwazên malbatan der barê xizmên wan ên windayî de, kêm e. Ya ku mijarê zehmet dike, ew e ku aliyên destê wan di vê babetê de heye, gelek in û tev jî xwe ji berpirsiyariyê dûr dixin (hêzên hikûmetê, artêşa azad, rêxistinên Nusre û Daiş). Her wiha tu belgeyên ku çarenûsa kesên windayî diyar bikin tune ne. Ev babet bi tevahî barê xwe, xwe dispêre li ser jinên çalakvan ên ku di biwarê mafê jinê û mafê mirovan de dixebitin.

## Şêwe û mekanîzmeyên alîkariyê yên yekser:

Çalakvanên jin ên ku di biwarê doza kesên windayî de dixebitin, li ser du biran tên dabeşkirin; kermendên ku di ofîsên Rêveberiya Xweser de dixebitin û çalakvanên civaka sivîl. Jin dibîne ku xwezaya karê wê ji rola wê ya di Ofîsa Karûbarên Civakî de de tê. Ew jî weke erkekî datîne ser milê wan ku tiştekî ji malbatên kesên windayî re bikin ku ev malbat pirsa çarenûsa xizmên xwe yên windayî dikin û wan pirsan weke daxwazname ji bo ofîsa ku têkildarî babeta kesên windayî ye, dişînin. Ofîsa têkildar jî Sûrî ne ji bo Kesên Girtî û Revandî.[23]

Li gorî navenda ku lê kar dikin, karê wan tê guhertin. Ev jî dihêle mekanîzm û rola wan dema malbatan bibînin û agahiyên peyda pêşkêşî wan bikin, cuda bibe.[24] Eger dema ku tê de agahiyên kesên windayî dirêj be, pêwîstî bi diyarkirina aliyê ku bû sedema windabûnê heye. Eger ev mijar girêdayî kesên ku di qonaxa desteseriya Daişê de winda bûne, wê hingê lêgerîn ji girtîgehan dest pê dike û ji birêveberên girtîgehan dipirsin ka kesek bi vî navî heye yan na. Çimkî em dizanin ku gelek kes di serdema Daişê de hatine girtin û heya niha çarenûsa wan ne diyar e. Her wiha serdanên fermî bo navendên girtinê û girtîgehan tên kirin da ku çarenûsa kesên windayî were naskirin. Eger kesên ku em lê digerin nehat dîtin, em xizmên kesê windayî agahdar dikin ku xizmê wan ne li ba aliyên ewlekarî û leşkerî yê li herêmê ye. lê eger kesê windayî li ba wan be, em xizmên wî di sedemên girtina wî û cihê ku lê girtiye de agahdar dikin.[25] Ev mekanîzmeya karê yekser û rasterast rêbazekî serkeftî ye ji bo agahdarkirina hin xizmên kesên windayî.

23 Hevdîtin bi Hêvî Ismaîl re (seroka Ofîsa Desteya Giştîya Karûbarên Civakî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê
24 Hevdîtin bi Mizgîn Hesen re (Seroka Navenda Lêkolîn û Parastina Mafê Jinê)
25 Hevdîtin bi Mizgîn Hesen re (Seroka Navenda Lêkolîn û Parastina Mafê Jinê)

Lê belê çalakvanên jin ên ku di rêxistinên mafê mirovan de dixebitin, tenê karê wan di çarçoveya wergirtina giliyan ji malbatên kesên windayî ye. Paşê ev çalakvan pêwendiyê bi aliyên têkildar û yên ewlekariyê yên girêdayî Rêveberiya Xweser û HSDê dikin û pirsa navê kesên windayî dikin. "Hin caran em hin bersivan bi dest dixin û hin carên din tu bersiv bi dest me nakevin." Meclisek hat avakirin, em jî tê de beşdar bûn, her wiha tîmek ji rêxistinên civaka sivîl û malbatên qurbaniyan jî beşdar bûn. Meclisek ji bo kesên ku li ser destê Daiş hatine windakirin, hat avakirin, peywira vê meclisê ew e ku rewş û dosyeya qurbaniyan bişopîne. "Doz hatin vekirin û dadgeh hatin avakirin da ku bi hev re ji bo bidestxistina mafê wan kar bikin." [26]

Meclisên jinê di Rêveberiya Xweser de, xwedî çalakiyên girêdayî rêxistinan in û hewil dide bi herêmên din ên Rêveberiya Xweser û yên derveyî rêveberiyê jî pêwendiyan bike, da ku komîteyekê avaa bike. Karê wê şopandina dosyeya kesên girtî ye û gihandina dosyeyên wan bo rêxistin û civînên navneteweyî û rêxistinên mafê mirovan. [27]

26 Hevdîtinek bi Evîn Cuma re, jêdera borî.

27 Hevdîtinek bi Feyrûz Xelîl re, Seroka ofîsa Jinê li bakur û rojhilatê Sûriyeyê

## Şêwe û mekanîzmeyên alîkariyê yên ne rasterast:

Li kêleka pêwendiyên yekser bi aliyên têkildar re (saziyên Rêveberiya Xweser, navendên girêdayî hikûmetê li bakur û rojhilatê Sûriyeyê hwd wekî girtîgeh û desteyên girêdayî karûbarên kesên windayî û navendên girêdayî hikûmeta Sûriyeyê), şêweyekî din ê alîkariyê heye ku di çalakiyên jinan de dixuye. Ew jî bi rêya beşdarbûna di pêngav û civînan de û pênasekirina doza kesên windayê û trajediya ku xizmên wan jiyan dikin diyar dikin.

Bi rêya van beşdarbûnan , alakiyên van jinan li hundir û derveyî Sûriyeyê tê pêşandan. Li parêzgeha Dêra Zorê –weke mînak- beşdarbûneke jinê di civîn û dîdaran de heye.[28] Her wiha ev çalakî li Reqa û Hesekê tên dubarekirin, lê belê ew ji aliyê pisporiyê ve xizan in û tenê di çarçoveya aliyên mirovî yên giştî de ne.

Di nav çalakiyan de piştgiriya destpêşxeriyan tê kirin, her wekî destpêşxeriya "Malbatên Qeyserê" û hin malbatên ku hewil dan çarenûsa kesên ji hêla Daişê ve hatibûn revandin binasin û "Malbatên ji bo Azadiyê".

Çalakiyên hin jinên din alîkariyê di pêkanîna hin çalakiyan de dike. Ew jî bi rêya piştgiriya pêvajoyên hevpiştî û cemandin û beşdarbûna di civîn û dîdarên ku ji hêla hin rêxistinên civaka sivîl ve tên lidarxistin. Lê belê kartêkirin hê lawaz e. Kêşeya sereke ew e ku tu rêxistinên pispor der barê piştgirî û gerîna li kesên windayî de tune ne. Hin pêwendî û çalakiyên hevbeş bi Rêxistina Lêborîna Navneteweyî û Yekîtiya Ewropayê re hene û hejmarek civîn der barê mijara kesên windayî de hatin lidarxistin.[29]

Çalakvanên li derve bi roleke hemta radibin. Ew jî bi rêya beşdarbûna di meşên ku li paytextên ewropî çêdibin. Li Cinêvê, beşdarbûneke piştgiriyê bi Komîteya Malbatên Kesên Windayî re hebû. Her wiha li Berlînê jî hejmarek pêngavên komîteyê hebûn. Hejmarek pêngavên biçûk an jî civînên biçûk jî hatin pêkanîn. Lê belê li gorî girîngiya xwe, dosye qebareya guncav wernegirt. Pêngav ango pêvajo dest pê dikin dema civîneke taybet bi "opozisyon û hikûmeta Sûriyeyê" tê lidarxistin, yan jî di roja taybet bi girtiyan. Ev jî dihêle ev çalakî bibin rotînî û bêbandor.[30]

28 Hevdîtinek bi Ayîşe Ceger re (hevseroka Yekîtiya Mamosteyan li Dêra Zorê.
29 Civînek bi Lîna Berekat re (korînasyona giştî ya Meclisa Jina Sûrî)
30 Zozan Elûş (jêdera borî).

## Beşdarbûna di karên belgekirin û komkirina agahiyan de:

Pêşbîniyên NY yên sala 2021ê, amaje dikin ku zêdeyî 100 hezar kes ji ber nakokiyên heyî li Sûriyeyê, windayî tên hesibandin. Ji aliyekî din ve li Sûriyeyê gelek rewşên kesên windayî yên girêdayî binpêkirinên mafê mirovan û ji bilî vê sedemê hene. Ev ji bilî sûriyên ku di encama revîna wan ji şer bi rêyan de jiyana xwe ji dest dan.[31]

Babeta belgekirinê, rêyeke girîng e ji bo çareserkirina babeta kesên windayî. Civaka sivîl bi roleke girîng di karên belgekirinê de dilîze. Lê beşdarbûn girêdayî metirsiya ewlehî, kêmbûna perepêdanê û pêvajoyên leşkerî yên berfereh e.[32] Ev jî dihêle belgekirin bibe perçeparçe û netekûz. Lê belê belgekirin ji aliyê benga agahiyan a navendî û serbixwe ve lawaz e. Her wiha belgekirin dibe ku bibe weke davkê dema navên nerast tê de werin bicihkirin. Ev jî ziyanê digihîne dilsoziya çalakvanan an jî rêxistinên ku li bakur û başûrê Sûriyeyê kar dikin.[33]

Di nav çalakiyên belgekirinê de, li kêleka belgekirina navê kesên windayî, hejmareke biçûk a rêxistin û destpêşxeriyan belgeyên Daişê û agahiyên ku li ser dîwarên navendên girtinê yên Daişê nivîsandî bi kar anîn. Her wiha hejmarek palpiştên din jî bi kar anîn da ku çarenûsa kesên windayî diyar bikin. Her wiha Şarii a ragihandinê û Navenda Sûrî ya Dadmendî û Lêpirsînê bi hezaran belge û plpişt kom kirin da ku alîkariya malbatan di naskirina çarenûsa xizmên xwe yên windayî bikin.[34] Dibe ku pêwîstiya vê belgekirinê bi kes û xebatên çalakvanan û hevkariya malbatan heye.

Dema çalakvanên jin tu belgeyekê bi dest bixin, alîkariya malbatan bi awayekî yekser dikin û hemû agahiyên di tûrikê wan de pêşkêşî wan dikin.[35] Her wiha hejmarek civîn di vê derbarê de hebûn. Jin di wan de beşdar bûn da ku rewşa karê belgekirinê şîrove bikin ango ji bo astengiyên li pêşberî wan derdikevin diyar bikin.

31 Nûnerê civaka sivîl a sûrî û malbatên kesên windayî, rêbazên çareserkirina rewşa kesên girtî gotûbêj dikin. (jêdera borî)
32 Kesên windayî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê (jêdera borî).
33 Hevdîtinek bi Zozan Elûş re (jêdera borî)
34 Kesên windayî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê (jêdera borî).
35 Hevdîtinek bi Evîn Cuma (Jêdera borî)

Ji ber ku navendeke yekbûyî ku tê de belgekirin kom bibe tune ye, belgekirin parçebûyî û ji hev qutbûyî ye. her wiha dibe ku belgekirin di çarçoveyeke teng de pêk were ku tenê rûbereke teng weke gund û bajarokan û carinan beşekî ji parêzgehekê bigire dest. Li ba hin çalakvanan hina gahî hene, lê ew agahî tenê girêdayî gund in.[36] Bi awayekî giştî gund nimûneya hevgirtina civakê ye û agahî li ser kesên windayî û malbatan hatin bidestxistin. Ne tenê yek lê belê hejmarek kesên windayî li heman herêmê hene. Ji berê wê jî pêvajoya lêgerînê bi awayekî giştî tê kirin. Dema çalakvanek li kesekî li gundekî digere, ew li kesên din jî yên windayî diger.[37]

## Pirsgirêkên belgekirin û komkirina agahiyan:

Ya ku belgekirinê zehmettir dike, ew e ku aliyên herêmê desteser dikin gelek in, şer heye û koçberî heye. Ya ku rewşê zehmettir dike, vedîtina gorên komî li Dêra Zorê û Reqayê ne. Termên kesên mirî ji 28 gorên komî yên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê hatin derxistin. Di van goran de 4072 term hebûn. Di navbera 13 heya 793 terman di her gorekê de hebûn. Heya niha tu pêşketineke berbiçav di diyarkirina nasnameya wan terman de pêk nehatiye. Dibe ku ev gor ji ber destwerdanan bizanebûn an jî borîna demê re xera bibin û nema bi yek carê term werin naskirin. Ji ber wê jî gerek e bi awayekî lezgîn kar li ser wan were kirin. Jixwe heya niha jî hê karê lêgerînê berdewam e.[38] Ev hejmarên navborî tenê yên gor û termên li parêzgeha Reqayê ne. Çalakvanên jin tenê nikarin vî karê pisporane bikin. Lê di heman demê de beşdarbûn ji bo naskirina van terman, gelekî kêm e.



36 Hevdîtinek bi Ruqeya Ewad Mensûr re (çalakvaneke ragihandinê ya Ajansa +SY ye)

37 Hevdîtinek bi Mekarim Ebdela (Rêxistina Behar)

38 Lêgerîna li kesên windayî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê (jêdera borî)

Di babeta girêdayî belgekirina kesên mirina wan hatiye tekezkirin de, pirsgirêkine din derdikevin holê, her wekî ragihandina mirina kesê windayî, nepeydabûna aliyekî ku mirov karibe berê xwe bidiyê, her wekî ofîsek an jî desteyeke taybet bi kesên windayî, nemaze ji ber ku hejmara kesên windayî gelek e. Her wiha pirsgirêka mîratê, çespandina tuxmê kesê mirî û deyn û pirsgirêkêm darayî yên girêdayî mirinê û ji bilî wan.[39]

Hejmarek çalakvanên jin li ser cûreyên pirsgirêkên ku pêvajoya belgekirinê rastî tê, li hev dikin, ku ew pirsgirêk di encama guhertina komên ku herêm desteser kirine de pêk hatine. Weke mînak li Dêra Zorê û Reqayê, hikûmeta Sûriyeyê, artêşa azad, Nusre û Daiş lê bedilîn. Vê jî hişt pirsgirêk di belgekirinê de derkevin, bi taybet ji ber guhertina hêzên ku herêm desteser kiribûn. Her wiha hin kesan di dema veguhestina ji herêmekê ber bi herêmeke din ve, yan jî di girtîgehan de yan jî dema veguhestina wan di hundirê herêmên rêjîmê de yan jî dema koçberkirina wan li derveyî sînorê Sûriyeyê jiyana xwe ji dest dan.[40] Dema hikûmeta Sûriyeyê hêdî hêdî xwe ji bakurê Hesekê vedikişand û piştî têkçûna wî di avdara 2013an de li parêzgeha Reqayê, Artêşa azad parêzgeh desteser kir. Ji çileyê 2014an de, Daiş parêzgeha Reqayê û hin beş ji parêzgeha Dêra Zorê û Hesekê dagir kirin û dewleta xwe ragihand. Wisa ma heya ku li Baxozê di da avdara 2019an de têk çû. Di encama guhertina aliyên ku herêm desteser kirin de, çalakvan kirine rewşeke zehmet de di babeta belgekirin û komkirina agahiyan de, nexasim di demên ku tê de desteserî dihat guhertin.

Li gorî hebûna li derve yan hundirê Sûriye, tirs tê dabeşkirin; di hundir de tirs mezin e. Ew tirs jî girêdayî ewlehiyê ye. axaftin li vir li ser destên ewlekariyê yên ku li deveran hene. Di encamê de rewşa ewlekariyê mirovan ditirsîne, çimkî dîroka xwediyê van aliyên ewlekariyê rewş e. Lê li derve karê çalakvanan hêsantir e, çimkî tu astengî li pêşberî karê wan tune ye û kesên kar dikin dikarin bi awayekî zelal ku xwe tê de bispêrin rêbazên mafêm mirovan dikarin kar bikin.[41]

39 Hevdîtinek bi Lîna Berekat re (jêdera borî)

40 Hevdîtinek bi Ayîşa Ceger re (jêdera borî)


41 Hevdîtinek bi Zozan Elûş re (jêdera borî)

# Qewîtiyên giştî:

1 Pêwîst e bingeheke agahiyan a navendî, durist û biewleh were damezirandin, navê kesên windayî were belgekirin, raporên fermî bi rewşan werin pêşkêşkirin û kesên mirina wan tekez bûye û yên ku weke windayî hatine tomarkirin lê heya niha tu palpişt der barê mirina wan de nehatiye ji hev werin başqekirin. Lê gerek e bingeha agahiyan, agahiyên hûrgil û peyda yên ku rêxistinên civaka sivîl, çalakvan, rêxistinên navneteweyî û tîmên xwecihî û aliyên din ên civakî yên mîna eşîr û ji bilî wan bi dest xistine, bihewîne.



2 Pêwîst e çalakiyên perwerdehiya teknîkî û kesayetî werin lidarxistin da ku çalakvan û jinên ku guh didin babetên lêgerîna li kesên windayî werin perwerdekirin û rêbazê komkirina agahiyan û ji bilî wê ji wan re were diyarkirin. Lê pêwîst e piştgiriyek ji hêla rêxistinên navneteweyî yên pispor ve hebe û pêwîst e ev perwerde bi serpereştiya Komîteya Navneteweyî ya Karûbarên Kesên Windayî be. Her wiha pêwîst e tecrube û pisporiyên çalakvanên li welatine din ku rastî heman bûyer û rewşên windabûnê hatine, bo herêmê werin veguhestin, her wekî tecrubeyên Iraq, Libnan, Bosne, Meksîk û Kolombiyayê.



3 Pêwîst e alîkariyeke darayî hebe da ku rêxistin û destpêşxerî handan bibin û bêtir di warê perwerde, belgekirin, lêpirsîn û danûstandina bi gorên komî û yên veşartî de, xwe xurt bikin.



4 Pêwîst e çarçoveyek were dîtin da ku çalakiyên girêdayî çarenûsa kesên windayî bi hev re têkildar bin û bi hev ve werin girêdan. Her wiha gereke girêdan û hevkarî bi tîmên lêgerînê û ofîsên Rêveberiya Xweser ên têkildarî vê babetê re jî hebe. Bi vî awayî dê şaneyek were avakirin ku bi rêya wê ev alî karibin agahiyan bidin hev û berî ku wan agahiyan bixin bingeha agahiyan a navendî, ji wan piştrast bibin.



5 Pêwîst e şêweyên hevpiştî û cimandinê werin piştgirtin, bi taybet bi rêxistinên navneteweyî re û di hundirê civaka sivîl a xwecihî ya aktîv li bakurê û rojhilatê Sûriyeyê de. Her wiha pêwîst e komcivînên pênasekirinê û çalakiyên ku armanca wan pênasekirina doza kesên windayî ye werin zêdekirin û van civîn û çalakiyan ne tenê di Roja Cîhanî ya Kesên Windawî de pêk bînin.



6 Pêwîst e piştgiriya derûnî bo malbatên kesên windayî were pêşkêşkirin, nemaze jinên ku berdêla windabûna xizmên xwe didin. Her wiha pêwîst e pêngavên piştgiriyê werin birêxistinkirin da ku piştgiriya malbatên kesên windayî bikin û êş û azara wan bidin diyarkirin û vê yekê bikin beşek ji têkoşîna civakî da ku ber bi tevahî civakê be biherike.



7 Pêwîst e doza guhertina zagona rewşên kesayetî were kirin da ku bandora zagonî ya windabûnê were sivikkirin. Pêwsît e dema wekaleta windabûnê were çêkirin, mercê ku dibêje pêwîst e"erêkirina ewlekarî hebe" were rakirin, çimkî merckirin tersî hukmên zagona rewşên kesayetî ya sûrî ye. pêwîst e zagonine nûjen werin dîtin ku li gorî zagonên wan dewletan bin ku berî niha tecrubeya kesên windayî jiyan kirine. Nexasim ew zagonên girêdayî mafên jinê, her wekî mafê xweberdanê bêyî ku mercê demê di çespandina windabûnê de were pêkanîn, mafê mîrat û xwedîkirina zarokan, mafê rêwîtiyê û mafê birêvebirina mal û milkê hevjîn dema windabûna wî were çespandin.



8 Pêwîst e ofîseke taybet bi karûbarên kesên windayî were avakirin. Ev ofîs girêdayî Rêveberiya Xweser be, çimkî piraniya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê niha di bin serweriya wê de ne. Gerek e ev yek bi hevkarî û hevrêziya bi rêxsitinên civaka sivîlên guh didin vê babetê re were pêkanîn. Her wiha pêwîst e bingeheke agahiyan a girêdayî vê ofîsê hebe. Ev bingeha agahiyan rewşan belge bike, rewşên mirinê ragihîne û her tim hejmaran nûjen bike. Gerek e yek ji peywirên vê ofîsê ew be ku pêwendiyê bi rêxistinên navneteweyî û xwecihî re bike û hejmara kesên windayî û navên ku tên zêdekirin pêşkêşî wan bike. Her wiha pêwîst e pêwendiyê bi malbatên kesên windayî re jî bi awayekî yekser bike. Ev yek dê vê ofîsê bike weke lêvegerekê ku bi rêxistin, malbat û çalakvanan re dê kar bike.





© Hemû Mafên parastî ne 2021

GAV FOR RELIEF & DEVELOPMENT

Mari Research And Development

Lasting Peace